



Welat

Hejmar «1» Rewşenbîrî Giştî-
Nivmehane ye
10 Gulan 2013
Nivmehane Serbixwe

Miletê Kurd di roja 22ê Nîsanê de, helkeftina çapkirina yekemîn rojnameya bi zimanê Kurdî dike, rojnameya Kurdistan ya ku Miqdad Mihet Bedirxan li Misrê çapkir, da ku bibe pêvajoyek e nû di jiyana Kurdan de.

Ew pêvajoya ku piştî roxandina mîrnişînên Kurdî, û piştî têkçûyîna şoreşên Bedirxaniyan û şoreşa Ûbeyd Ellahê Nuheyîrî, û hilfirîna pêvajoyên bîr û ramana Kurdî. Rojnamevanî neynika gela ye, û bi wê asteya çand, bîr, raman û pêşketina civaka miletan tête naskirin.

û ji ber giringî û bandora wê di pêşxistina civakî de di hemû mijarên jiyana miletan, rêjîmên serdestiya Kurdan dikirin herdem şerê hemû kuncên ragihandinê dikirin, da bimînin serdest û cihê kontrolkiirînê li ser vî milletî, û berê wî bidin paşketinê û cudabûnê ji derdora wî, û êdî bi hêsanî jî bikaribin rêberiya Kurdan bikin.

Piştî gelek çarçuyên dîrokî yê di ser herêmên Kurdan re derbas bûne, ta bi şoreşên buhara gelan di Rojhilata Navîn de dijî rêjîmên zordest û kedxwar, û yê ku Kurdên Sûriyayê jî beşeke di van şoreşan de bûn, Kurdên Sûriyayê hewil didan ku çalakiyên çandî, sîvil, yasayî û çapemenî bi rêxistin bikin, û endam û kadroyan di wan mijaran de ava bikin, da amade bin ji rêveberiya qonaxê re.

Pîroz be bîranîna 115an ya zayîna yekemîn rojnameyeke Kurdî li gelê me, yê ku reseniya xwe bi vîn û perweriya xwe diyar kir, tevî hemû asteng têve derbas dibe û şerên ku li hemberî wî têne kirin.

Aras Yûsiv



welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya



ciwanên Kurd û çîroka nikilê sipî



Gava ku em dibêjin ciwan ,di cih de hêza bê sînor ,coş û gonelî tê bîra me .ciwanî buharê bi hemû rengên xwe yên bedew nîşan dike ,mofirka herî xweş di temenê mirov de ye ,ew şîrikê bejna jiyane ye ,ew fabrîke û kargehan digerinê ,ew hemû mofirkên jiyane dilivîne ,ew êzinga şoreşan e ,ev tiştên ku me anîne zimên pirsekê dihêne holê ,ma gelo li gorî van daneyan û piştî ku du sal ji şoreşa azadiyê û rûmetê derbasbûne rola ciwanên Kurd li gorî bûyerê bû ?

Çi astengî derketin pêşiya wan ?ev pirsek fereh e , di nêrîna min de ,mixabin di paşxaneyê me ya civakî de gelek tiştên paşmayî cihê xwe girtine,wek mînakeke girêdayî bi mijara me ve ,mezînen me bi çavekî bêbawerî li ciwanan dinêrin ji dêvla ku wan bikin bin berpirsariyê ,ji wan re dibêjin hûn cahil in loma heya temenekî dirêj di mînin kesin kê-m-ezmûn û nikarin barê jiyane hilgirin ,zor mixabin ev mînak vedikşe ser rewşa rêzanî ,rêz û hurmeta me ji porsipî û mezînan re heye,ew in rêber û pêşeng lê ma gelo tişteki asayî ye kuciwanên Kurd di nav rêzên partiyên bimîninê bê ezmûn û nikilsipî ?

Bîrwerê Gêncô

Dil ê welatê min

Buhar a teqereqa «Erebokê»

Digotin:
Zivistan sare,demarên raman û hestan sar û bar dike,û hêviyê xortan bê tebat dike, lewra em bê hêvî diman ji hemî zivistanên pêşeroj û paşerojê, û me cil û bergêhen sitûr û germ li can û cendekên xwe dipêçandin da lehiyên seqemê pişûkdan û pişûkêşanên me bê rê û cih nekin.

vexwarina wî ya rojane bû, piştî wî li bawernameya xwe ya zanîngehê di sindoqa bîroka xwe ya bê hest û nest de veşartî û razayî meyzekir wî nedizanî kû ew hest û nest wê hişyar bibin li ser teqereqa dolabên erebokek belengaz fena perîşaniya wî.
Wî nezanî bû kû ew teqereq wê bibe zengil, wê bibe nifir û wê



Zivistan diçû û buhar dihat, û helbet buhar alava guhertinê ye, û nîşana jiyana nû ye,lê tevî vê tiştê buharên me jî mîna zivistanê bi sermayê û cemedê re bêhtirîn rojên xwe dibûrandin .ji ber vê yekê seyran û geryanên me bi tirs û saw derbas dibûn.

Ji nişkave, birûskek dengbilind xwe nîşan da, weke xewneyan bû, mîna sawêran,yan jî lêlan bû, giyanek di cendikekî de veşartî bû, di şeqam û kolanê bajarê xwe de dilivî, keftelefta rojane dikir,li xwe digera, pirsê hebûn û nebûna xwe dikir.

Belkî ew bi van hemî tiştan ne difikirî,tenê mereqa wî xwarin û

hemi hest û gumanên veşartî û perçiqî hişyar bike. û ne tenê kerwanên birçîbûnê û tîbûniyê wê bi xwarin û vexwarin bike, belê ewê kerwanên rêça azadiyê û rizgariyê jî bi zar û ziman bike. Haya wî jê nebû kû teqereqa «Ereboka»wî wê bibe nîşana demsalên nû,demsalên herdem rengîn û bi xemil û xêl.

Narîn Omer

Efrîn



Penageheke bê kon e Roja şemiyê di dîroka 2.Nîşanê de rojêke xwedî naverok û taybetiyeke cûda bû , di wê rojê de artêşa azad derbasî taxa Şêx Meqsûd bû ,weku tê zanîn ku Şêx Meqsûd yan jî weku Kurd ji wê re dibêjin çiyayê Seydoji aliyê leşkerî ve cîgeheke stratîjîk e . ji ber ku ew bi bilindahiya xwe li hemû taxên derdorê dinêre û hukum dîke . ev tax piraniya şênîyên xwe Kurd in , bi taybetî û hêmeniyê dihate naskirin ,lewra hejmareke mezin ji xelkên ku ji taxên bi şer

reş ji koçkirinê di heşê mirovên Kurd de vejand . Hejmara penaberan bi sedhezaran hat nirxandin ,tevî derfetên Efrînê yên sînorkirî dîsa xelkê Efrînê kanî ev bo belat hambêz bikira .tê bîra me, Turkiyê bi hemî hêz û giraniya xwe ve ,gava ku hejmara koçberan li wirgehên wê gihîşte heştê hezarî li def û zurnê xist û bang û gazî li civaka navnetewî kir û alîkarî xwest .vêca Efrîna delal wê çawa vê bêtarê dê kedî bike ,bi nêrîna min heger rêxistinên mirovan û civaka navnetewî vê mijarê li destê xwe negerîne û bi lez nelive

e li ser gotina siyasetmedarekî Kurd ,ango hejmareke mezin ji penaberan li dibistanan bi cih bûne ,li gorî jêderên pêbawerhatinê li bajêr çardeh dibistan çar hezar penaber hambêz kirine ,ji bilî ku her malbatekê du malbat û bêhtir mêvandar kirine . Heya niha komîta xizmetguzarî ya girêdayî desteya bilind ,van dibistanên dagirtî bi rêve dibe û bi alîkariya xêrxwazên Efrînê xwarin ,vexwarin ,paqijkirin, û guhdana tendurustî pêşkêş dîke Ji aliyekî din verêxistinên lihawarçûyîne pir kêmin ,xuya ye



reviyane ûtê de cîwarbûne . Piştî ku artêşa azad derbasî Şêx Meqsûd bû ,ev tax ji tang û topên rêjîmê re bû armanc û lê pevçûnên mezin di navbera herdu aliyên de qewimîn ,ev bûyera awarte tîrsek bê pêşinde di nav xelkê de belavkir û lehiyek ji penaberan bi ser Efrînê de rijand .pêre bîranên

,di demeke pir nêz de wê li Efrînê aloziyên mezin peyda bibin . Roj bi roj buhabûn zêde dibe ,pertal li sûkê kêmin dibin ,dermanxane hêdî hêdî vala dibin . Di destpêkê de me got ev buyer warte ye .ji ber ku Efrîn ji mêj ve dorpêçkirî ye û di dema niha de bûye penagehek lê bê kon

ta aniha tenê Kurd li hev dinêrin ,û ji ber kêmbûna avê talûkeyeke mezin tê holê, belkî gelek nexweşî belav bibin û vegirin û bi taybetî havîn li pêş me ye,

Bîrwerê Gêncô



Azad hêj nû dest bi dibistanê kiribû. Mamostê wan ê hatibû fêrgehê, navê wan û yê bavê wan yeko yeko ji wan dipirsiya. Hinek paşê dora Azad hat Mamoste jê pirsî:

-Navê te çi ye?
 -Navê min Azad e.
 -Navê bavê te çi ye?
 -Bavo ye.
 -Navê bavê te tune ye?
 -Sê birayê min hene. Em hemû jê re dibên bavo. Lê mirovên din dibêjin Ehmed.



-Çima tu nabêji navê wî Ehmed e?
 -Dema ez dibêm Ehmed, bi min hêrs dibe.

• Li hemberê hev in Zarokek wenda bibû.
 • Mirovên der û dora wî jê dipirsiyan:
 • -Kuro, mala te li ku ye?

-Li hemberê parkê ye.
 -Park li ku ye?
 -Ew jî li hemberê mala me ye.



Waliyê baş Mirovek ji bajarê re walî tê tayînkirin. Vê peywirê digre ser xwe û diçe bajêr.



Ji bo gel û der û dora bajar nas bike, hinekî digere. Di vê gerê de li navçeyekê, ji mirovek dipirse:
 - Heta niha sûda kîjan waliyên vî bajarî ghiştiye we?

Mirov bersiv dide:
 - Waliyê du berya we pir baş bû:
 - Baş e. Sûdek wî ya çawa ghiştibû we?
 - Hê neghiştibû vê navçeyê, di rê de wefat kir



• Porê Spî Lawik ji diya xwe pirsî:
 • -Dayê çima porê te çi çiqas diçe sipî dibe?
 • Diya wî:
 • -Tu her carê ku min

dibehicînî, télek porê min spî dibe.
 Lawik:
 -Û hat fêmkirin, çima porê dapîra min hemû spî bûye

Kurd û eşkence

Eşkence û kuştina kurd bi destê birayê kurd du taq, belkî jî sed taq diwartire ji ya bi destê dijminan. Taaaahl e, zilindar e, jahra silêmanî ye, qet nayê daqurtandin. Mirov mirina zer bi çavê serê xwe dibîne, mirov hevî dike tune ba, mirov nifiran li xwe dike û mirinê dixwaze û bi destê kurdekî nehata eşkence kirin.

Şebîheyên rêjîmê dikarin cerg û hinavên dê û bavên zarokên mîna Hemze El Xetîb li ser kuştina Hemzeyê biçûk bişewitînin, ew encama perwerdeya wan e, li qama wan tê, lê mixabin, xuyaye li herêmên me jî jî hin kesên ku mîna teba ne derketine bin ronîya heyvê û dikarin jiyana zarokan li ser bavên wan bikin jahr û ziqûm, dikarin wan zarokan ta ebed bê ken û listik bihêlin.

Kes wisa nake biranooo, kes wisa li birayê xwe yê kurd nake, ew ne karê we bû, karê hin in din bû, lê we ji bedêla wan hinan ve kir, ew hin ku gihan wê herêmê, dibe ku pêşî te yan jî zaroka te ya di dergûşê de li pêş çavên te daliqînin.

Eger wan kurdan, ew ên ku hatibûn eşkencekirin

Kurdistanê kurdan bi erzanî firotibana, yan jî bi navê çil melyon kurdî mafê azadî û serxwebûna Kurdistanê bi maf in herêmkî û kesane guhertibana, buhayê wan daliqandina piştî birajtinê bû, ne lêdan û eşkence bû. Xwezî şebîha wisa bi min û zarokên min bikirna, û kurdan bi kurdan nekirba, û kurd bi destê kurd nehata kuştin û eşkence kirin.

Şerme, weleh şerm û fehête, hetîketî ye. Ji berê ve gotin e: "Golîkek garanekî xera dike".

Bi hêviya ku kiryarên wiha yên ku tenê dikevin tûrikê rêjîmê, tenê rêjîma li ber rûxandinê, sûdê jê werdigre birano, rawestin û dubare nekin, pêşeroj ji azadiyê reye, ji dadmendiyê reye, vêga agahdar bin, ji ber heçê gunehkar dê ji bo dadgehan bê kişkişandin û cezakirin. Dîrokê em baş eşkence kirine, êdî hûn hevdu eşkence nekin. Rewşa me kurdan a îroyîn a ku encama şerpeze û nelihevkirina hêz û aliyên siyasî ye, eşkenceya herî dijwar û bi bandor e

Qado Şêrîn

XORT ÊMÎŞ IN...Û ŞOREŞ IN!!!!

dibêjin:çare û hêviy her milletekî xortên wî ne.

Xort ew êmîşê welêt in û hêviya pêşerojê ne,ji vê yekê em dibînin gelê pêşketî hemû tiştî ji xortên xwe re pêşkêş dikin û mal û mewdanê xwe dixine bin xizmeta wan de da ku nifşeke paqij û xwedî bîr û bawerî rake ji bo bikaribe pêşengiya civaka xwe bike bi awayeke rast û dirist û ji dev her tiştê kevin û ne baş berde ,nifşeke ku bercewendiya welêt û gel deyne ser bercewendiyên kesayetiya xwe ji ber baş dizane ku welatê wî ew ê dê bikaribe wî û pêşeroja wî biparêze.

Lê mixabin li welatê me em dibînin berevajî wê çêdibê ,dewlemend û yên têr xort û zarokan di karxan û fabrîke û xwaringihên xwe de bi erzanî wan bi kar dihênin û li kolanan tiştên nebaş weke firota pakêtan bi wan dikin,wan dûrî xwendin û zanîne dikin da bimînin kole li ba wan û dûrî pirsgirêkên welêt û gelê xwe bibin.

Ên ku rêk û pêk ji rabûna şoreşên bihara gelan danîn ji xwe ew xort bûn ,ew xortên jîr û zana û şoreşger bûn ,ên ku nema zilm û bindestî qebûl dikirin,ên bi rûmet û azadîxwaz ji bo guhertin û pêşketina welêt,wan pêşkêşya şoreşa kir li Tûnisê,Misrê,Lîbyayê û Yemenê ta bi ser ketin,li Sûriyayê jî xortan bi dest şoreşa

xwe kirin bi şêweyeke aştiyane û daketin kolanan xwepêşandan kirin û komît û hevrêzên xwe çêkirin li hemû deverên welêt û navê şoreşa xwe kirin şoreşa azadiyê û rûmetê ,bû şoreşa gelê Sûriyayê bi tevahî ,ji bo hemû reng û netewiyên tede,armanca wê bû ruxandina rijîmê û avakirina rijîmeke demuqratî û pir jimar,ji bo destpêkirina qûnaxeke nû bi rêveberiya nifşekî ku bawerya wî bi biratî û wekhevîyê werê ,dûrî zilm û sitemkariyê,û her mirovek li gor karê xwe cihê xwe bigre,lê mixabin bilez partiyên kilasîkî û kevin û hinek kom û aliyên olperist li pêla şoreşê siwar bûn û berê wê ji hêvî û armanca wê guhertin,ji aste ya aştiyane kirin aste ya çekdarî ,êdî nebû şoreşa gel belê bû şoreşa komên çekdar yên dixwazin bighên desthilatdariyê li ser xwîna gel,ji vê yekê gelek destên ji derve ketine nav vê şoreşê de û her yek bi çavê bercewendiyên xwe lê dinêre.

Ji wan sedeman şoreşa Sûriyayê qelis bû serketina wê dijwar bû ,ji vê yekê em dibînin gelek ji wan xortên kû serkêşiya şoreşê dikirin yan şehîd ketin û yan jî derketin derveyê welêt ne ji ber tirsê rêcîmê lê ji ber astengiyên ku partiyên kilasîkî û komên çekdar xwedî bîr û baweryên tarî ku ji wan re derdixistin.

Lazgîn dêrûnî



Xweziya Min Bi Te!



i bilî ku yek ji rûsîpiyên bajêr bû, vî camêrê han, bi gelek tiştan dihate naskirin; bi oldariya xwe ya têr û tije û têgihîştî, bi xwîna xwe ya sivik û qerf û henekên xwe yên şêrîn, bi pend û şîretên xwe yên kûr, bi cib û desmala serê xwe, bi riha xwe ya sor û hinekirî, bi welatperweriya xwe, bi çixara pêçayî ku pir zirav û tenik dipêçand, bi dikana xwe ya teng û biçûk... û bi diltenikî û dilnermiya xwe dema bi jinan dida û distend.

Tim devliken û zimanxweş bû. Kesek li Dirbêsiyê tune bûnavnişana dikana wî nasnedikir. Hema em diketin dergehê dikanê, bi lez û bez, weke 'çipçipkê' dihat pêşwaziya me û bi xêrhatina me dikir û digot: ha, tu bi xêr hatî, ser herdû çavan, keremke bêje; tu çi divê?. Dema me tişteke ji dikanê dikirî yan ne dikirî, dîsa bi gotinên xweş û şêrîn, me bi rê dikir û xatira xwe ji me dixwest. Her wisa bi hemû kesî re bû. Me dixwest herdem em li civata wî bin, lê em biçûk bûn, hê zarok bûn. Dema ez bûm xort, yekem car ez derbasî mala wî bûm, havîna 1997an bû. Wê çaxê, di nava xebata siyasî de bûm û me amdekariya kovara ROJDA dikir û ji bo ez peywendî

bi kurê wî yê helbestvan re çêkim, min li dergehê mala mele xist. Wî ji min re dergeh vekir û got: ser çavan, keremke, Fethelle li mal e. Aniha dikana wî bitenê ye. aniha sûka Dirbêsiyê bê mele Hesenê rihsor e!. aniha kesek din tune ye wê çixara tenik û zirav bipêçe û diyarî çixarkêşan bike!. Ew dilê nerm û ter û mezin xatira xwe ji hemû jin, keç û qîzên Dirbêsiyê xwest. ew dengê nizim û qedîfe û melûl, xatira xwe ji guhdarên xwe xwest.

Erê, yek ji rûsip û stûnên civakî û olî yên Dirbêsiyê koça dawî kir. Piştî vî temenê dirêj, ka xewna te ya dawî, peyva te ya dawî û pirs te ya dawî çi bû?. Dem û dewran, jan û êş û derdên vê jiyane piştî me xûz kirin seyda, te barê xwe avêt ser pişt û milê kê? Yan te bi xwe re bir cihê aniha tu lê ye?.

Ey kalemêrê dilciwan, xweziya min bi dilê te, bi aram te, bi janên te yên veşartî, bi pisrên te yên wînda, bi tilî, dest, qelûn û gopale te, bi ken û civata te... xweziya min bi xatirxwestina teya bêdeng.

Hoşeng Osê

cejna rojnemevaniya kurdi li bajarê dirbêsiyê...

di bîranîna dameziranadina yekemîn kovar bi zimanê kurdî, ya ku bikaranîna wê rabû miqdad midhet bedirxan li welatê misrê di sala 1898an binavê kovara kurdistan.



xelkên dirbêsiyê bi sedan xwepêşandanek li darxistin bi navê duşema cejna rojnemevanên kurd bi helkeftina vê rojê briz zeredeşt eliko got û daxwiyakim: ev roj rojêke dirokî ye ji hemû miletê kurd re û bi taybet ji rojnemevanên me re yên ku gelek îşkence û zorî ji destê rêcîma setemkar didîtin lê piştî şoreşa sûriyayê karê rojnemevanên kurd azad bû.

miletên sûriyayê bi giştî û miletê kurd bi taybetî hêviya wan ji rojnemevanan ku rast bin di karê xwe de û bêhtir li ser êşa milet binivîsin.

saadûn al sino

Xortên Kurd ên derveyê welat û rola wan di şoreşê de



Piştî ku şoreşa Sûriyayê destpêkir di destpêka sala 2011an de , ew jî li ser dozeke ji zarokên Deraayê bo azadiyê bû,

Bi renekî fermî , bajarên Kurdî di rêza pêşî de bûn ji nav bajarên din ên Sûriyayê ..yên ku piştgiriya zarokên Deraayê kirin

Tiştê ku giring e li vir .. ciwanên Kurd kesên yekemîn ku tevli şoreşê bûne , xwepêşandan bi hejmareke mezîn li bajarên Kurdî pêkanîn .. di destpêkê de Qamişlo bû .. Amûdê bû, piştîre bajarên Kurdî yên din xortên Kurd rûbrûbûna alava kuştinê kirin û bang kirin bi xistna rêcîmê Tevgera ciwanan herdem di civiya dijî Tundûtîjiya rêcîmê ya ku çû rûbrûbûna şoreşê bi xistna çalakvanan di zindanan de , bi kuştina xortên şoreşvan...mîna kuştina Mişel Temo, Ciwan Qutna, xwîna Kurdan bi xwîna braiyên

xwe yê din re di nexşeya Suriyayê de Normal e ku ciwanên Kurd ser 2 beşan bin .. beşek jê: di hundirê welêt de .. tevgera şoreşê li ser piştî wan e ,, beşê dî : derveyê welêt .. yê ku bi lez ragihandin ser helwesta xwe bi şoreşê re û ragihandin bi piştgiriyeke sampaî û ragihandinê bi brayên xwe re di hundir de Bi zoriya rûbrûbûna hêzên ewlekariya rêcîmê ji xortan re û girtina çalakvanan û binçavkirina wan .., ev bû sedem ku beşek ji çalakvanan ji welêt derketin

Xortên Kurd yê penaber dikarin piştgiriya şoreşê bikin , dikarin piştgiriya birayên xwe yê beşdarî şoreşê bûne bikin, piştgiriyeke ragihandinê, di riya berdewamkirina alîkariyan ji şoreşê re .. bi taybet di warê abûrî de.. ji ber ku piştgiriya abûrî pir giring e ji bo berdewamiya

kar û xebatên wan.. ji wê karê ku Xortên Kurd dikin pir mezîn e , Ez aniha dibînim bangewazî pir giring e .. peydakirina nan .. û pêdiviyên jiyanê , derman , şîrê zarokan ..û peywendî digel alavên ragihandinê re jî pir pêwist e .. ji ber wisa hevrêzên xortan karekî pêwist dîtin li derveyê welêt û tê xwestin ji wan ku bi renekî rêxistinê were berdewamkirin , rawestî be bi şoreşê re bi dilekî mezîn ..nexasim ku mana wan li derve dihêle ku serbest bin.

Di dawiyê de û bi kurtî ez dibînim ku rola xortên derveyê welêt ji yê ku xebatê di hundirê welêt de dikin ne hêsantir e û ne jî kêmtir e.

Helbest Yûsiv

Gavin ji bo pêşketinê...



Gelê ku li çanda xwe xwdî dernekeve mîna dara ku kok û rîşeyên wê hew têne avdan, ji hev dikeve, dirize, û windadibe, ji bo vê yakê mîletê me yê Kurd dê xwest ku jin, xort, keç û mêr hemû bi rola xwe rabin di warê parastina çanda xwe de û pêşxistina wê, da em bikaribin berxwedanê bikin ji bo mayîna me .

Îro em Kurd xwediyê mafê jînê û azadiyê ne, em li ser xwe qabûlnakin paşketinê, em hemû dizanin ku îro mîletê me yê Kurd li ser rêya azadî û serfraziyê

gavin mezin avêjtine.

Ji bo vê yekê ,gelek ji mîlet li bajaran û li gundan kar û xebatê dikin û xwe birêxistin dikin di gelek meydana de wek abûrî , candî ,şano ,medîa û tenduristî .

Gundê Maşoqê û Girbikêlê û gelek gundên din, zimanê Kurdî di dibistanê de didin hemû şagirtên gund û di nav gundiya de vî zimanî didin nasîn û di nav civînên xwe de gel bi dîrok û çanda Kurdî didin nasîn û çawa ku Kurd xabat kirin ji bo vê dirok û çandê ya ku siyaseta kevneperest dixwest ku birawestîne û ew ê dê wêran bike.

Lê belê bi vîna mîlet û xwesteka wî di mayîna de, hemû pîlanên wan kesan têkçûn.

Û ev xebata ji bo perwerdeya ziman dibe dihêle nifşên tînan nifşeke zimannas be û li Kurdayetiya xwe xwedî derkeve

Ji bilî ziman jî, korsên tenduristî jî tînan bikaranîn, da hinek kes amade bin ji bo rewşên dijwar eger bi ser wan de bînin, û çawa ku bikaribin nexweşan jî derman bikin di pêwariya nexweşxaneyan de.

Û karin wek perwerdeya jînê jî tînan bikaranîn, da jin jî amade be ku bi karûbarên xwe rabe û rola xwe di civakê de bileyize bi avakirin û pêşxistina wê di hemû mijaran de û li ser hemû asteyan.

Samîra umar

Muzîka Kurdî û Amûrên wê

Gelê Kurd bi çanda xwe, bi taybetî ya muzîkî ve, xwedî kelepûreke pir kevn e di rojhilata navîn de. Û gelek çand ji hezar salan ji hêla şaristaniyên kevn wergirtine. Wekû nimûne, em dikarin bêjin ku Kurdên Rojava ji çanda Hûrî û Mîtanî re, wekû neviyan têne hesabandin.



Û tê zanîn ku bi taybetî, milletê hûrî di muzîkê de gelekî şareza bû, û em dikarin vegerin kevirê Orkêşê yê ku li Ugarîtê hatiyê dîtin li Sûrî, di salên pêncî de, ev kevir jî 3350 sal temenê xwe heye, û tê de straneke bi gotin û şeweyê pêşkêşkirina wê xuya ye, bi jimar û simbolên nivîsa mîxî. Û helbesta ku tê de diyar e li keleha Orkêşê dihate pêşkêşkirin, û ji hêla çend zanistan ve hatiyê nivîsandin û notekirin, û wekû kevntirîn muzîka nivîsandî di dîrokê de tê hesabandin.

Herwiha, milletê Kurd bi şeweyekî cuda yê muzîkê tê naskirin, û ev tişt xuya dike bi miqamên taybet û amûrên muzîkê yên cûrbecûr. Çi amûrên têlî, bayî yan retmî. Amûrên kurdî jî, vedigerin serdemine pir kevn û dîrokî.

Di vê gotarê de em ê dê li ser amûrekê bi xîfîn ku cihê xwe di piraniya malên Kurdî de heye...

Tenbûr:

Amûreke pir kevn e, li Kurdistanê tevî tête bikaranîn, kevnahiya wê vedigere çend hezar sal. Belgeya herî kevn di destê me de, peykereke li bajarê Mûsilê hatiyê dîtin, temenê wê jî 7 hezar sal e, û têde tê xuyan ku mirovek li Amûrekê muzîkî wekî Tenbûrê dide

Di serdema sasaniyan de, tenbûr girîngiyeke olî ya mezin distîne, ji ber pîroziya vê amûrê li ba ola Zerdeştîyan. herwiha, Avesta jî bi dengê tenbûrê re dihate xwendin.

Tenbûr, wekû amûreke têlan, di şeweyê xwe yê kevn û folklorî de, ji 3 têl û 14 perdeyan pêk tê li gelek deverên Kurdistanê. Û tevî ku tenbûr li bakur û rojavayê Kurdistanê di van deh salên dawî



de, bi kodeke mezin û 23 perdeyan, yan bi (Baxlemê) tê naskirin, lê, li Rojhilat, hîn şeweyê xwe yê resen parastiyê (li derina Rojava wekî Efrînê, Amûdê.. herwiha li Şengala başûr jî tenbûra kevn tê dîtin).

Tenbûrjenên herî binavûdeng ew in yên Yarsan (Ahlulhak), li Hewramanê. Û li cem Yarsanan, tenbûr cihê pîroz digire di ola wan de, ji ber ku rêwresmên olî bi



meqamên tenbûrê têne lidarxistin. Û hinek ji meqamên yarsanan temenê xwe digihe 1000 sal, yan bêhtir jî, û heya demeke kurt jî, ev meqam ne gelêrî bûn (ne peyda bûn ji gel re), bo wilo, Elî Ekber Muradî, hemû 72 meqamên tenbûra yarsanî tomar kirin. Wekû nimûne, yek ji van meqaman navê wî Sar Tarz e, çîroka vî meqamî vedigere dema ku Heftan(Xuda) mirovê yekemîn afrand, rih nexwest bikeve laş de, bo wilo jî tenbûr hate afrandin û bi meqamê Sar Tarz rih kete laşê mirvî de.

Herweha, tenbûr li Rojava ji bo dîlanê û meqamên dengbêjiyê jî tê jenîn. Ji aliyekî din ve, tenbûra Xurasanê jî cihê xwe yê girîng heye.

-Tenbûra Xurasanî

Tenbûra Yarsanî

Pîvera Tenbûra Amûdê

Tenbûrjenên bi nav û deng li rojava: Apê Adîk, Bavê Selah(Efrînê), Ezîzê Temo, Seîd Yûsiv...hwd .

الحياة بلا هدف هي حياة بلا قيمة

إلى نفسك سلبية فأنت سوف تعاني العديد من المشاكل لأن الثقة بالنفس امر مهم وضروري في الحياة وفي تحقيق الاهداف على حد سواء.

ثق بنفسك وقدراتك وطموحاتك فكل نجاحات اليوم ما كانت إلا خطط واهداف الأمس

العائق الثالث هو التأجيل فالكثير من الناس يعيشون مبدأ (الصباح رياح) نعم المبدأ سليم ولكن ليس أن تتخذ شعاراً وتخطو عليه في كل اللوقات.

ابدأ
بعملك ثق
بخطوتك
تقدم لا
تراجع
كل هذه
الكلمات
عندما
تجعلها في
قاموس
حياتك تأكد
بانك سوف
تنتهي ما
تفكر به
وتصل إلى
ما تهدف
إليه.



هدفه مبرراً موقفه بأنه يخاف من المجهول أو خوفه من انتقادات الناس التي سوف تنهال عليه عندما يعلمون بهدفه أو خوفه من النجاح نفسه كمن يكون لديه مشروع وقام بعمل دراسة اقتصادية وجدول زمني لكن خوفه من المبادرة يُبقي المشروع ضمن كلمة خطة لا أكثر وهذه الخطة تبقى فكرة في الراس ولا تخرج إلى الواقع لتدخل مرحلة التنفيذ او تطفو على سطح الماء وبعض من الناس يعللون خوفهم أو عدم مبادرتهم إلى تجارب قديمة عاشوها في الماضي وتألمو

الهدف من أهم الأركان التي تساندنا في تحقيق أحلامنا فمن لا هدف له كمن يمشي في طريق لا نهاية له أو موقع لا عنوان له حيث يقول المثل الصيني (إن لم يكن لديك هدف فكل الطرق تؤدي إلى هناك)

دعني الدن أوجه السؤال لك عزيزي القارئ (هل لديك هدف في الحياة) إن كان جوابك بنعم فأنت ضمن ٣ % الذين لديهم اهداف وإن كان جوابك لا فأنت ضمن ٩٧% الذين ليس لديهم اهداف هكذا كانت إحصائيات جامعة

هارفرد
من خلال
دراسة
أجرتها.

كم من
الناس
يضيعون
اعمارهم
ويهدرونها
دون
تحقيق
أحلامهم
أو
اهدافهم
منهم من
يحتفظ بها
لنفسه

منها فحفر الخوف اسمه في قلوبهم ولايد له في هذه الحالة أن لا يربط تجارب الماضي بالمستقبل لأن فشل الماضي يمكن له أن يكون الدافع لنجاح المستقبل.

دعني اطرح عليك سؤالاً أخر ايها القارئ ،هل الطفل في الثالثة من عمره يخاف من شئ؟ في الحقيقة الطفل لا يخاف من شئ وهو في هذا العمر لكن الخوف يؤثر عليه عندما يبادر إلى تجربة تؤلمه كالأقدام على لمس النار ففي هذه الحالة سوف يتكون لديه الخوف من النار نتيجة الألم الذي عاناه.

العائق الثاني هو كيفية نظرة الشخص إلى ذاته فإذا كانت نظرتك

كحلم يصحى وينام عليه ومنهم من لديه هدف معين خطط له خلال وقت زمني على أمل تحقيقه.

وكلنا نعلم بأنه لا يوجد هدف من دون عوائق أو مواجهات من الحياة ولكن الفروق تبقى بين فئات الناس فمنهم من ينهار ويتحطم عندما تواجه اصغر المشاكل ومنهم من يبقى صامداً راسخاً في موقعه يكافح من اجل الوصول إلى الهدف الذي رسم له على مدار العمر الذي عاشه وهذه العوائق كثيرة ولكني ساسرد لكم اهمها:

إحتل الخوف المرتبة الأولى من العوائق التي تواجه الإنسان في حياته فخوف الإنسان من عدم تحديد

العائق اربع والأخير عدم تصقيل القدرات ، ليكن بمعلوماتك عزيزي القارئ بأن الإنسان لديه كم هائل من الطاقات والقدرات في داخله ولكنه لا يستخدم إلا ٥% منها . فلنفجر هذه الطاقات التي في داخلنا ونستغلها للوصول إلى اهدافنا فداخلنا كنز من الطاقات ولنتفائل برسم أهدافنا ونثق بأنفسنا لنخطو دوماً نحوالنجاح.

وليبقى قول جون ماسون بروان خاتمة عسى أن نستفاد منها السعادة الوحيدة هي أن نفني انفسنا من أجل تحقيق غاية عظيمة في الحياة .

مروة يوسف

نساء الثورة وروح الأنوثة

بالعودة الى الحديث عن صورة المرأة السورية في وسائل الاعلام التي كانت تصدر المظاهرات الجماهيرية فان صورتها الان قد تغيرت، فنراها متناثرة الجسد نتيجة لقصف النظام الدموي من جهة، او تنحب وهي مكلومة بأطفالها، او تمتد يد الترجي لرغيف خبر خلف الحدود في مخيمات تحولت الى حدود دولية مع الجوار الاقليمي بل إن جسدها تحول الى ساحة لجهاد بعض شيوخ "البترودولار" بعروضهم الجهادية للزواج منهن لنصرة شعبنا بعد ان انتهى جهاد زواجهم من البوسنيات دون المرور بالصوماليات الى ابن تسيير الثورة بيد المرأة السورية؟ هل تعلن مناضلات سوريا وسط الركام المادي والخواء الفكري ان "النظام القمعي امامنا والمعارضة المتناثرة وراءنا، فما علينا الا النضال من اجل اعادة انسانية من خسر انسانيته حينما ارتبط بالنظام ونضيف روح الانوثة بدمقرطة خطاب المعارضة؟ من ارتقوا الى السماء شهداء تركوا خلفهم نساء لسن حائرات وأن كان الألم يصعب تحمله، ومن وجدت نفسها مهجرة مع الآلاف من العائلات وصمت العالم ومنظمات حقوق المرأة والطفل هي ستتجاوز خواء هذا العالم، كل امرأة سورية دفعت ثمن حرية وطنها وما دمارا في الممتلكات يقينا مطلقا ثورة الوطن الواحد ثورة الكرامة ثورة الإنسان الحر ستنتفض عن الجميع عبئ العقود المريعة من حكم هذه العصابة وهي الثورة ذاتها ستثبت للعالم شجاعة وبسالة السوريين والسوريات وستثبت كما قالها الثوار أن المرأة في سوريا ليست كباقي نساء الكون في سوريا لانخرج المرأة من ضلع الرجال بل تسقط من رحمة السماء، كل نساء الكون لهن رائحة العطر أما نساء سوريا لهن رائحة التضحية بلاحدود ورائحة الانتماء في سورية المرأة هي ام الشهيد وأخت الشهيد وزوجة الشهيد وهي في غالب الوقت شهيدة لتصنع بتضحيتها وطن ينبعث من جديد

للفا خالد



نضالهم الثوري والديمقراطي والذي يجب ان يتضمن حقوقهن وفق المعايير والمعاهدات الدولية فتجربة العراق وبعدها بقية الدول التي شهدت التحولات ليست في صالح نضال المرأة ونيل حقوقها. ان المرأة السورية التي شاركت ومنذ اللحظات الاولى في الثورة السورية عبر مشاركتها الفعالة في المظاهرات السلمية لإسقاط النظام في دمشق قد شهد تحولا ليس في صالحها بعد عسكرة الثورة والتي جعلت منها مادة اولية لجرائم النظام من جهة وهامشا في العمل النضالي وهذا ما تجسد بحضة السوريات في تركيبة المجالس والمعارضات والهيئات السورية في الخارج. كورديا تميزت مشاركة المرأة في الحراك الثوري بالمشاركة المكثفة في التظاهرات على غرار ما فعلته نساء سوريا عامة لكنها انفردت بشكل اوسع في التنظيم العسكري حيث تدربت على حمل السلاح وشاركت في معركة سري كانييه لتطهيرها من المرتزقة الذي غزوا هذه المدينة الواحدة وتشارك المرأة الكوردية في حماية المدن الكردية عبر الحواجز المقامة على حدود القرى والبلدات ذات الغالبية الكردية

بعد مشهد ثوري و نشيد جماهيري بلغة القمح والحلم، وفي خضم تجاور الشعارات التي وحدت الطبقات المتناحرة، والقوميات المتحاربة، والديانات المتباعدة، وايدولوجيات اعلنت فيما بينها وقفا لإطلاق نار الصراعات الفكرية ظهرت هوية جديدة في سوريا ما بعد "درعا" فكتابات اطفالها على الجدران قد اشربت لمرحلة جديدة بمخاض عسير ما زال في طور التشكل "هوية الثورة" لم ولن تلغي الهويات الخاصة " القومية، الدينية، الجنسية" بل يمكنها ان تعيد انتاجها بدمقرطة خطابها وسياساتها وبرامجها المستقبلية للاعتراف، وخلاف ذلك فان "الخاص" سيبرز ويطغى ليؤدي الى خلق "هويات" و"فضاءات" مختلفة للثورة خطابا ومناطقا للتواجد واختلافا للمصائر وهذا ما يحدث في الثورة السورية لفشلها بتوحيد خطابها وقواها. المرأة السورية وبعد نتائج الثورات في ربيع شعوب منطقتنا والقوى التي استلمت السلطة بدأت تتسائل في ظل غياب موقف واضح من قبل اطراف المعارضة السورية لحقوقها المستقبلية عن المطلوب ضمن

الابجدية الكوردية

مصطلحات رياضية:

werziş = رياضة
yarîgeh = ملعب
heywan = ساحة
gog, top = كرة
êrîş = هجوم
parastin = دفاع
lîstikvan, yarîker = لاعب
golar = حارس مرمى
hev kêşî = تعادل
qehreman = بطل
lêdan = إصابة
bihnvedan = استراحة
bispor = محترف
bazdan = ركض
xweavêtin = قفز
avjenî = سباحة
dema zêdekirî = وقت اضافي
pêşbirk = منافسة
westiyayî = متعب
dawî, kotayî = نهائي

Dadwer = قاضي
Dozger = محقق
Karmend = موظف
Gendelî = فساد

مصطلحات أدبية ولغوية:

tîp = حرف
berhem = عمل - منتج
pirtûk = كتاب
raman = فكرة
gotar = خطاب
naverok = فهرس، محتويات
weşan = نشر
wêje = أدب
wêjeyî = أدبي
roman = رواية
daner = مؤلف
helbest = شعر
pexşan = النثر
destan = ملحمة
çîrok = قصة

مصطلحات جغرافية:

derya = بحر
rûbar, çem = نهر
zerya = محيط
kendal = وادي
derbend, tengav = مضيق
bender = ميناء
paytext = عاصمة
daristan, dehil = غابة
biyaban, germiyan = صحراء
erdnîgarî = جغرافيا
deşt = سهل
gir = تل

مصطلحات قانونية:

Dadwerî, Mafdarî = عدالة
Wekhevî = مساواة
Desthelatdarî = سلطة، حكم
Rêxistin, Sazî = تنظيم، منظومة
Rist, Destek = جهاز، نظام، أداة
Şalyar = وزير، مستشار
Parêzger = محافظ، والي

معا نكون نموذج المواطن السوري

جزء يسير من الظروف التي أدت الى تكوين شخصية المواطن السوري الهزيلة المزدوجة المرعوبة المتفسخة الفاسدة والمفسدة لكل من الحاكم والمحكوم ، القاضي الذي يصدر هذه الاتهامات والمحكوم متلقى هذه الاتهامات مثل الشخصية السورية مثل الفتاة التي تفقدها اسرتها وهي في سن السابعة من عمرها وعاشت وكبرت في الشوارع والذقة في اماكن الفساد والسرقات وتعاطي المخدرات والدعارة والسرقة حتى بلغت الاربعين من عمرها حتى التقت بذويها . أراد ذويها اصلاحها فلابد بهذه الاسرة ان تصبر وتتابعها باستمرار وتعالجها مدة طويلة حتى يتم اصلاحها نهائيا . ومتى تم اصلاحها نهائيا (ان كان هناك مجال للاصلاح) فنحن ابناء المجتمع السوري لابد لنا ان نميز بعضنا ونتميز عن بعضنا بكافة الخصائص والمزايا من ابناء مكونات هذا المجتمع الجميل المتنوع الفسيفسائي من اجل ان ننجح في الية تكوين الشخصية النموذجية لاحترام خصوصية كل فئة من فئاته ونصل الى حد الاندماج الكامل للمجتمع السوري تحترم الاعراق والقوميات المختلفة من عرب واكردا واشوريين ودروز وتركمان وجاجان ونحترم الاديان من مسلمين سنة ومسلمين شيعة ومرشدين وسموعليين ومسيحين كاثوليك وسريان ارثوذكس ومارديين وطوارنة وكلدان ويزيديين . كل يمارس حقوقه القومية دون تجاوز حدود القوميات الاخرى وممارسة الشعائر الدينية الخاصة بما لا يضر ويسبب للفتنة او الطائفة الاخرى والسعي لايجاد موازين ومقاسات دقيقة للتوازن الوطني بين مختلف اطيافه والكل في اطار الشخصية الوطنية السورية والكل يقوم بالتزامه باداء واجباته تجاه وطنه ومجتمعه ودولته بدون تقصير ومعيار التميز هو تكافؤ الفرص وتسلسل اللكفاءات وعلى مبدأ الرجل المناسب في المكان المناسب بذلك نكون قد سعينا الى مجتمع مدني علماني تعددي تشاركي ديمقراطي والعمل على مبدأ خلية النحل الكل يعمل لخدمة الوطن والمواطن بدون تمييز سوريا لكل السوريين يتمتع المواطن بمزايا المواطنة ويقوم كل مواطن بواجبه على اكمل وجه تجاه دولته للمواطن فيها حقوق يمارسها وواجبات يؤديها على مبدأ الغرم بالغرم

لا ضير ان نعترف جميعا نحن ابناء المجتمع السوري بأن الشخصية هي من نتاج البيئة التي نعيش فيها وتكون من التراكمات والترسبات الثقافية والاجتماعية والاقتصادية الخ وانعكاس عن ثقافة الطبقة الحاكمة فان شخصيتنا ومنذ مايقارب نصف قرن ترسخ تحت هيمنة الحزب الواحد القائد للدولة والمجتمع وهو حزب البعث العربي الاشتراكي وقوة الدولة الامنية المهيمنة على كافة جوانب الحياة ودون استثناء والتعامل مع المجتمع السوري معاملة المجتمع القطيعي المنقاد امينا وبدون تردد لاحول ولاقوة له وقسم المجتمع السوري الجميل خلال هذه العقود الى اسلام و مسيحين ويزيدية. قسم الاسلام الى سنة وشيعة وسموعية ومرشدية الى قوميات اكراد وعرب ودروز وتركمان واشوريين وعمل فيها على مبدأ فرق تسد والكل يراقب الكا امينا حول المجتمع السوري الى عملاء ومراقبين على بعضهم البعض وعمل على افساد المجتمع واصبح كل موظف مضطر لارتكاب الخطأ نتيجة الحاجة والضغط الامني نتيجة التدخل الامني في كل شيء والخوف من المحاسبة وكنتم الافواه وتوجيه الاتهامات بدون مسؤولية وبشكل مزاجي وعشوائي منها (انت عربي صدامي - انت مسيحي كاثوليكي - انت درزي عميل اسرائيل - انت درعاوي جاسوس - انت كردي برزاني - انت كردي ابوجي - انت تتعامل مع دولة معادية - انت كردي انفصالي - انت كردي تعمل من اجل اقتطاع جزء من سوريا والحاقها بدولة مزعم انشاؤها - انت عربي تحض من هبة الدولة - انت ناشط او سياسي توهن نفسية الامة وتضعف الشعور القومي - انت سياسي تعمل على خلق الفتنة بين عناصر الامة وزعزعة الاستقرار- انت متهم بجرم عرقلة مسيرة ثورة التحول نحو الاشتراكية وتخريب اقتصاد الدولة - انت متهم بجرم حيازة وادارة الاموال بشكل مناف للقانون (الاضرار بالاقتصاد الوطني) ... الخ وهذا غيض من فيض الاتهامات التي تعلو اغلفة الاضابير والمصنفات في المحاكم السورية مثل محكمة امن الدولة العليا بدمشق ومحكمة الامن الاقتصادي ومحاكم القضاء العسكري الاستثنائية وبقية محاكم الجنابات وبداية الجزاء في مختلف محاكم سوريا هذا

Tenê karim

Ji mizgeftên ola evînê
 ji bilindahiya bejna perweriyê
 Li ber ronahiya agirê
 pêdarîyê
 Xwe dirêjî xweziyan dikim
 Ku min kariba
 li gor asta lehengiya we
 Pîrozbahiyêke
 Nwerozî Ji we re rêkim

* * *

Tenê karim
 Gurzeke peyman
 Bi bayê sibê re rêkim
 wêneyekî zindî
 ji nîşana vejîna dîrokê
 ji we re diyar kim
 tenê karim
 bi hestê we bijîm
 bi çavên we meyzekim
 kirasê vê berxwedanê
 li xwe kim
 tenê karim aniya xwe
 heberî niv kabê we kim

* * *

ka ? ku çavên min
 zindana we bana
 sibê û êvara
 fêrî firê bi bana
 ta ebed ew tu car
 melûl nebana
 rêka welat rêka welat
 ji we xwiya ye
 li ser dêmên we
 roka pêçayî bi sê renga
 zelal û nêzik

Xaçerêk

rast

nîsvîskarê çîroka sînema--1
 amûdê
 fermandar--2
 oleke semwî-navek eerebî--3
 karger--4
 (hogir(bi zarava soranî--5
 tîpin dúbare- drûtin-rojek ji--6
 rojê heftiyê
 (strank şivan perwer(vajî--7
 Agir- pêlek ji pêlên Radiyoyê---8
 xwarina dewaran
 serekê karê me--9

serjêr

Pirtûka pîroz a zerdeştiyî--- 1
 (dengê axînê(vajî
 (Îro (bi zaravê soranî--2
 nîgarkêşeke navdar-- 3
 -Tenê di çiyar de peyda dibe--4
 Wêneyên me--5
 Ji sedema êşê--6
 Diyrbekir--7
 salî 1450 Berê zayînê bi--8
 miletek ji mezopotamiya- Xwarina
 dewaran
 paytexta memleketek pir--9
 kevin (vajî)-mîna peyamê tê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2		■		■		■			
3						■			
4		■		■					
5		■					■		■
6							■		
7	■							■	
8			■			■	■		
9									

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	E	H	M	E	D	N	A	M	I
2	V	A	L	A	M	A	R		
3	I	S	L	A	M	E	T	A	
4	S	V	A	S	E	N	D	A	M
5	T	A	S	N	A	N			
6	A	A	K	E	L	N			
7	M	E	E	N	I	K	A		
8	A	R	F	M	E	M			
9	H	O	S	T	E	E	M		

Festîvala buharê Newroza Rojavayê Kurdistanê



Li Qamişlo di roja yekşemê -04-07 2013an de yekemîn festîvala buharê li darket.

Ji hêla Hemahengiya Sewa yê û Hevrêza xortên Siryan ve û bi beşdarbûyîna gelek kes ji Kurd, Siryan, Aşûrî, Ereb û hemû milletên Herêmê yên cûr bi cûr.

Festîval serê pênc rojan li dar bû bi çalakiyên rengareng

Di roja yekemîn de kereke mûzîkî li dar ket ji hêla Koma Arta ya mûzîka Kurdî, ya ku çend berhemên ji folklorê deverên Kurdî û çend berhemên din yên rengareng, û Koma Çenga Or ya bi zmanê Erebî û Siryanî jî çend berhem pêşkêş kir.

Di roja duyem de filmeke ji derhênera Lubnanî Nadîn Lebikê hate pêşkêşkirin, tevî pêşengeheke ji Nîgarên çend nîgarkêşan li dar bû.

Roja sêyemîn roja şano bû.

Di roja çaremîn de filmeke derhênerê Kurdî yê navdar Behmen Qobadî yê bi navê Kîse jî dikarin bifirin.

Di roja pêncemîn festîval bi dawî bû û dîsa bi mûzîkê tevî helbestê.

Festîval peyamek bû ji hemû milletên Sûriyayê bû, ku em dikarin digel hev bijîn bi biratî û aşti bê nakokî û dikarin jiyana xwe bikin mîna buhara Qamişlo ya xweş û geş.

Îmad Talatî

Axxx...War



Seydê Qertmînî, ji gundê Nisran, li binxetê, xwe tev her kar û axeftinê dikir, pêre jî diket nav pesin û xweşiya gundê xwe de, gundê ku ji dema fermanên reş ve, li serxetê bi malbata xwe re jê koçber bibû: -Qertmîn....Axxx....Û ax Qertmîn!.... Bivirê êzing birinê, ji destê xortan digirt, bi her dû destan bibanî dixist û bi himeta xwe ditanî xwar!....Heger qurm li ber bivirê wî parçe bûba, hingî serê xwe bi şanazî hildida û digot:

-Bavoo...Ev çi ye!...De welahî li Qertmînê bivirê min nedibû du car!.. Û heger bivirê wî vale di çû, hingî bi axînek germ re, piştî xwe rastdikir û bi tengezarî di got: -Axxx...Ava Qertimînê!....Ava binxetê, xwîn li me weravt!...Di çaxên werzan de, ku petîx di peşkivîn, petîxekî destarîkî bi destekî digirt û li dora xwe di zivirî û bi dengê bilind di got: -De êdî Welahî, yên Qertmînê du caran ji vî petîxî girtir dibûn!...Di ser kaniya avê re, ya ku di ber çemê Nisran de, ku bi destên şivanên gund hatibû vedan, di sekinî û bi keser digot: -De bi navê Xwedêkim, liba tirî dinav ava kaniyên Qertimînê de di şeşqitî!....Ava zelal... Zelal û cemidî, wek ava Zimzim!.... Sal derbas bûn û Seyêd hîn ji vî pesnî û ji vî cûde bûnê nehatiye xwar, heya wê sala ku mirovek ji

gundê Nisran, ku ew jî cîranê Seyêd bû, bi barê qaçaxê re gihist gundê Qertimînê û piştî çend rojan li Seyêd vegeheriya û li ber wî û gotina Qertimînê ma guhdar!...

Li ber siha camiya gund, di nav koma gundiyan de, wek tora xwe carik din Seyêd xwe kuxand û dest bi axeftinê kir û di nav re ket pesnê ware xwe!...-De Welahî li Qer..

Cîranê wî axeftina wî bi ken birî û got: -Xalê Seyêd, min Qertmîn dît!.... Çavên Xalê Seyêd, pêre pêre bi vî gotinê re ronî dan û bilez pirsî:

-Êêê.....Kaniya li rexê rojhilat.....

Dara Tu.. ya dinîvê gund de....Xaniyê me....?

-Kroo Xaloo...Kaniya çi ...Dara çi û xaniyê çi....De Welahî gundekî ziwa û sor, xaniyên gevîrî bi ser hev de hêrivî û kambax!...Gundekî gijilî!....

De bi Xwedêkim, dema ti diketî nav pesnê gundê Qertimînê de, min digot aniha qoziyek ji bihiştê!.... Çavên Seyêd, ji çend ronakên hûr şilbûn û li xort nehêrt û bi keser berisva wî da: -De lawê min, were ji vî dilê re bibêj!....De welahî li ber dilê min Qertimîn bihişt bû!... Û wê di vî dilî de bimîne bihişt

Abbas-Abbas

Cervantes û Xanî



Min li tevgera ku li hawîrdor peykerê mezin ê nivîskarê ispanî Miguel de Cervantes temaşe dikir. Ew peykerê mezin ê pirşikoh li meydana Plaza li Madrîda paytext. Li jêra wî, peykerê Don Quijote (Don Kixotê) bi rima xwe ya dirêj û li rexê peyrewê wî yê navdar Sancho Panza li ser kerê xwe. Ji nişkê ve min dît ku ez dûrî komika bi xwe re dikevim û ber bi binaniya peyker de diçim. Kamereya xwe amade dikim û dixwazim wêneyekî bikişînim.

Ez di peyker de mijûl bûm. Peykerê ku her du peykerên lehengên romana wî ya navdar jî li binî jêre rewêjtine. Li hawîrdorê bi sedan turîst diçûn û dihatin û wêne li ber kerê Sancho û rimê Don Quijote jî xwe re digirtin. Serdana min ya ji gora Ehmedê Xanî re li Bazîdê berî bi pazde salan hate bîra min. Wê katê çavên min li turîstan neketin. Tenê nuqteyêke leşkerî ku leşkerên li ber nobedarî dikirin dişibihîn Bekoyê Ewan li wir hebû.

Ehmedê Xanî bi tenê bû. Kesek nehatibû serdana wî. Li vir jî bi hezaran û ji dehan dewletên dinyayê hatibûn da ku li bin teriya kerê Sancho wêneyên xwe bikişînin! Ez pê hesiyam ku giyanê Ehmedê Xanî wekî bayê hênîk, nermik nermik dadiwerive hinavê min, ez pê hesiyam ku ez Ehmedê Xanî me û piştî sêsed salî hatime Madrîdê da ku gilî û gazinên xwe li ba vî nivîskarê ispanî yê mezin bikim. Ez nêzîkî bingeha peykerê mermer bûm û mîna yekî ku xwe bide nasîn min di dilê xwe de got:

Ez Ehmedê Xanî me, piştî te bi sî û pênc salan ji xeybê fek bûme (Ji dayik bûm). Ez kurê miletekî me ku bawer nakim te navê wî bihîstibe. Bawer nakim ku yek ji hemwelatîyên te yên niha jî min nas dike. Ez jî mîna te ketim ber pêlên bêhêvîbûnê. Min jî çîroka xortekî nivîsî ku bi ciwaniya evînê şerê kirêtiya civaka feodal dikir mîna ku çawa lehengê kitêba te şerê aşebayê welatê xwe bi rima

xwe ya şikestî dikir.

Bi dehan salan e ku vîzevîza guleyan û gurmegurma teqîna top û qenbereyan li ber guhê min e û gola rihetiya min û xewa min a ebedî şêlû dikin. Tu jî ji xwe re li dengê tiqetiqa evîndaran û muzîka maçên wan guhdarî dikî.

Rast e tu xizan û bêçare li serê kolanekê ji kolanên Madrîdê mirî, lê niha bi sedhezaran têne serdana te û baqên gulan li ber piyên te datînin û mîr û padşah jî têne serdana te. Ey siwarê romana ispanyolî, piştî mirina min jî ez êşiyam û min jan kişandin ne mîna te ku bi mirina xwe bûyî padşahêk.

Xanî ji xeyalê min derket û ez bi tenê mam. Ez nivîskarê kurd yê vê sedsalê û min hey li rûyê Cervantes û destê wî yê ku bi kitêbekê girtiye dinêrî.

Çi birîn e ku nivîsandin wê di wijdanên me de dihêle! Çi hêz e ku pêçiyên me ber bi pênûsan de dikişîne! Çima jiyan me hildibijêre da ku em bibin têkoşerên ku bi tîpan şerê kirêtiya vî çîhanê dikin? Em in pêxemberên êşa mirovayetiye ku bombeyên kînê ji hev dixin. Îca rejîm tînan me û giyanên me dorpêç dikin, sînor jî li ber me radibin û me bi gunehê jiyanheziyê tawanbar dikin!

Pirsên min li ber piyên Cervantes herikîn mîna siya piştî nivro li bin roja Madrîd a ronîdar.

Jan Dost



ولات «ثقافية - عامة»

العدد واحد ١٠ أيار ٢٠١٣

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya